H

E

B

E

S

T

# *PÊSÎRÊN DANAVÎ*

Cihan Roj

## civata bîranînan

li bin siya darek ji temenê xwe kaltir
min dengê we li tayên şehkirî rêzdikir
hêsir li ser lêvên kevirî laçikek ji xwêdanê şilbûyî
dest lê dişidiyan
laçika guvaştî weke kevzeya li pêşên şikevtên Heskîf dibû
malzaroka ta yên şîn

dem di nav devê meqes de bi rêşî
dengê Dîjle di nav por de destê dayikek
Kemençe ya 'Mûrado' dibû bê ku ji evînan afirî

rehek di canê ter de bû derî û li jiyanê vebû
di dilê kevirde deng e
li derdora gor ên bi dergîstî pirsek avî ye:

ji çend dilopên hesinî me benek rêsa
pênûs di dest me de terikî li cIvata bîranînan
demsal havîn
berhem di gomên bi yek kulek de mexelbûyî
ji keresiyên baniyan
ji lûtkeyên aşîtan çemek li ariyên bizot bîn da
pênûs tevrê seqakirî
reqsa masiyan di coho yên ji lêvan teniktir de hêviyên zîstan...

## DELAVÊN LATAN

***Pîrejineke hilhizî***

***di bin zinareke asê de***

***li ser cilekî gelêrî***

***aşpervana delavên latan bû***

***fişekeke dagirkeran..***

***xwîna wê neqşeke dî li cil zêde kir...***

***1994***

# QORÎÇÎ

***Henga zarok xwîn  vedirêşin***

***ew bi gotinên  qusandî re***

***çirayê ditemirînin***

**1994**

## BAJARÊ YEZDAN

***Ku raman dike orîn***

***Heskîf dike nalîn***

***hewrên ji çavên bedewan reştir***

***li gola tî dicivin***

***1995***

## ÇEKÊN HERÎ XURT

***We weke cotên pêsîran***

***zimanê   me  parast***

***di meha çile de***

***reşikên şiliyê***

***lehî rakirin***

***1998***

**SERGO**

***Sergo mîna dilê dagirkeran***

***dîwar lê nayê lêkirin***

**1998**

**RISTÊN STÛR**

***Bilûr careke din deng nade***

***Reşemî xwe vedişêre***

***di çavan de dilopên avê bûne teneyên xwê***

**Reşemî, 1999**

## ÇAVKANÎ

***1.***

***Li ser bûtên şîlanan sor dixemile***

***hêşînê tarî azmanî ye***

***bistîyên ter***

***weke Edûl , Dewrêş bihewîne***

***2***

***dilop in***

***ji teneyên qevdeyê***

***Gîhayê di zinaran de bişkivî***

***3***

***Ev helbest***

***morîkeke***

***bi çiyayên asê dimije***

***28 rêzber***

## KARESATÊN TENIK

*Wextê lêvên te weke berfîna zozanan dibişkivin*

*ji çavên te tîrêjên biharê bi rê dikevin*

*li ber  rezên avdayî dibin destan*

*li welatê me*

*hewrên reş  di nav ava Dîcle de wenda dibin*

*1999*